# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (221):

## Bînerdayînin li ser binpêkirin û tewanên "El'cebhe El'şamiyê", talankirina 75% ji werza zeytûna, pevçûnin li "Meydankê", şewatin di daristanan de



















Bi ser ku belgeya wî tijî binpêkirin û tewan e, karê wî li ser serê giropine nandozên Sûrî li Lîbiya bi serpereştiya Turkiyê, û cersandin û riswabûnên gihîştiniyê, "Mihemed El' casêm - Ebû Emşe" serkêşê Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" ê ji Hikometa Anqerê û istîxbaratên wê ve pir nêzîk, û yê ku rê jê re hatiye vekirin ku bandoriya xwe li Efrînê -piştî destêwerdana "Desteya Tehrîr El'şam" têde- fere bike, li vê dawiyê bînerdayînin li ser binpêkirin û tewanên Milîseyên "El'cebhe El'şamiyê" li Bajaroka "Mabeta" û gundine din ên di bin desteserkirina wan de bûn belav kirin, û daxwaz dike ku hin serkêşên "El'şamiyê" werin cezakirin, û ji "Encûmena Islamî ya Sûrî - Istanbûl" û "Hikometa Sûrî ya Demkî" doz dike ku "komîtên şopekirina rasteqînan" rêke wir; Ma gelo! "Hemahengiya Sûrî - Ixwanî" û yên li dorê yan aliyên din ên rikber

û Civaka Navdewletî bi hewcî bînerdayînên tewankarekî li ser hevparê xwe yê tewankar e, ta ku bilive û zordariyan riswa bike û ên zor dîtine mafên wan lê vegerîne!?

**Ev jî binpêkirin û tewanin têvel in:**

**= Bînerdayîn:**

Piştî ku Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" bajarok û gundin -berê di bin desteserkirina "El'cebhe El'şamiyê" û "Lîwa'i El'weqas" de bûn (ên ku "Desteya Tehrîr El'şam" ji Herêma Efrînê qewitandine)- desteser kirin, rabûn dest danîn ser biryargehên wan û hertiştê têde ku berê wan dizîbûn û talan kiribûn ji xwe re birin, û hewil didin bi riya belavkirina bînerdayînina li ser binpêkirin û tewanên "El'şamiyê" û vegerandina hin malên ku dest danîbûn ser ji xwediyan re li Gundê "Merwaniyê Jêrin" - Navça Cindirêsê û Bajaroka Mabeta, wêneya xwe xweşik û sipî bikin; Hin jê jî bi vîdyo hatine kişandin:

- "Osman Ne'iso" keyayê Gundê "Hisê/Mîrka" - N. Mabeta dipeyive ku çawa biryargeha aborî ya "El'şamiyê" vêrgî li ser werzên zeytûna ferz dikirin, û ji firotina nên -piştî rawestandina nanpêjgeha gund- çiqas qezenc dikirin, û milîseyên wê hin hemwelatiyên gund bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re digirtin û vêrgiyên diravî li ser wan ferz dikirin.

- "Menan Henan" ji Gundê "Erendê" - Navça Şiyê tekez dike, ku Milîseyên "El'şamiyê" ji bo gera li kevneşopan û dizîna wan, dora /600/darên zeytûnê yên wî û pismamên wî li nêzîk gund hilkirin, û axa wê jî kolan û rêşkirin, ta ku erd kêl bû.

- Keyayê Gundê "Şiketka/Şiketa" jî - N. Şiyê dibêje Ku Milîseyên "El'şamiyê" kompiyûtereke "Laptop" û giropeke taqeta elektirîkroniyê ji dibistanê dizîn.

**= Girtinine bêsûcane:**

- Li 25.10.2022an. Z, girtina Hemwelatî "Mihemed Mislim Qelender /35/ sal" ji xelkê B. "Mabeta", ji aliyê Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê" ve, bi behaneya ku wî berê zeviyeke zeytûna ye xalê xwe "Ezet Qelender" - li nêzîk "Pira Sûsê" û piştî çateriya bajarokê bi aliyê Reco ve -Bê agahdarkirina wan- beref kiriye.

- Li 26.10.2022an. Z, girtina Hemwelatî "Se'îd Mihemed Reşîd/Se'îd Tepe /56/ sal" ji xelkê Gundê "Şêx Mehmedlî - Meydana" - Navça Reco, ji aliyê rêbenda çekdar ve li çateriya Gundê "Emara" - Milîseyên "Ehrar El'şerqiyê", û ta niha çarenûsa wî nediyar e; Divê bê zanîn jî ku ew li ser mîkrobasa xwe ya bînekan karê ajovaniyê dike.

**= Werza (mûsima) zeytûna:**

Bi ser destdanîna fere li ser malmewdanên hemwelatiyên ne li herêmê û ferzkirina vêrgiyan li ser berhema werza zeytûna bi tevahî de, girse û şêweyên dizînan - ji aliyê çekdaran û anîndeyên jê nêzîk ve - ên ku bi şev û roj dighêjin zeviyên zeytûna zêde pir e û ji salên berê pîstir e, bi ser wan payînên nerast ve yên ku milîs ji xwe re dikin behane, da ku vêrgiyên zêdetir werbigrin (parêzvanin bi xwe dizin jî); Wek nimûne:

- Milîseyên "Firqit El'sultan Silêman Şah" (yên ku Milîseyên "El'cebhe El'şamiyê" ji B. "Mabeta" qewitandine), vegerîn da ku 40% vêrgiyan li ser berhema zeytê ji malmewdanên ên ne li wir ferz bikin, û herweha jî 5% li tevahiya berhema werzê li gundên "Mistika, Erendê, Tirmûşa, Me'iserkê, Reca, Hisê/Mîrka û Şîtka" - herdu Navçên Şiyê û Mabeta, piştî qewtandina "El'şamiyê" jê.

- "Ebû Xalêd El'cebelî yê ji Gundê Cûzif - Çiyayê El'zawiyê/Idlib" û berpirsiyarê aboriya Milîseyên "El'lîwa'i 112" li Bajaroka "Be'idîna" bi quretî û qebhet şelandina çiwalên zeytûna (heryek /85/ KG) ji hin hemwelatiyan berdewam dike, bi ser de jî 50% vêrgiyan li ser berhema zeviyên hin kesên ne li wir ferz dike(wek nimûne: /140/dar ên Hemîd Şukrî Mistefa, /70/dar ên Selah Şukrî Mistefa), û çinîna berhema zeviyina bi tevahî bê ku beşekî jê ji bo xizmetguzatiya du salan ji xwediyan re bihêle(mîna: /90/dar - Ebdîn Kekec, /150/ dar - Kemal Arêf Elo, /200/dar - Dilovanber Mihemed Hemqaflo, /80/dar - Dilovanber Xelîl Kekec, /90/dar - Hesen Hisên Şe'iban, /70/dar - Idrîs Hisên Mistefa, /80/dar - Arêf Elgolik, /50/dar - Reşîd Ezet Mixtar, /500/dar - Ehmed Bêrem Elo, /100/dar - Mihemed Bekir Elî, /200/dar - Ferat Ebid El'letîf Hebeş, /80/dar - Mihemed Ehmed Şe'iban, /40/dar - Seydo Mihemed Îbiş) bi ser ku beşek ji wan ta niha werese ne, û yek ji dê û bav an yek ji herdu hevjînan an jî şûngirên (wekîl) xwedyên malmewdanan li wir in; Weha jî hin

têne neçarkirin ku zeytûnên xwe li Guvêşgeha "Dumiliya-ya "Ûsame Rehal" - cîgirê serkêşê El'lîwa'i" biguvêşin.

- Li Gundê "Zerka" - N . Reco, Milîseyên "Feyleq El'mecid" berhema (/30/ darên "Horîk Dawod", /13/ darên "Cemal Bîlal Miho" û /10/ darên "Mihemed Hemze" bi tevahî çinîn.

- Li G. "Kêla" - Navça Bilbilê, Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" berhema /20/ darên "Şiyar Mihemed Me'imo" çinîn.

- "Ednan El'xuweylêd/Ebû Wlîd El'ize - ji Bajarê Humsê" berpirsiyarê biryargeha aborî ya Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad", hemî "rêdank - wekalet" li Gundê "Kotana" - N. Bilbilê baykot kirin, û 10% vêrgî li ser berhema zeytûna ya tevahiya xelkê gund ferz dike, û yê nede jî wê were kêmrûmetkirin û cezakirin.

- Milîseyên "Feyleq El'şam" qedexe dikin ku xelkê gundên "Qizilbaşa, Bêlê, Naza, Bakur Rojhilatê Meydankê" zeytûnê zeviyên xwe yên di bin desteseriya wan de beref bikin, ta 1.11.2022an. Z, bi behaneya ku berhema zeytûna li pêş guvêşgeha wan a li nêzîk Gundê "Naza" pir kom ser hev bûne, û wan neçar dikin ku divê tenê li wir biguvêşin,  ta ku rêjeya dixwazin werbigrin, lê di heman demê de jî derfet û azadiyê didin dizan -çi çekdar an anînde bin- da ku bi şêwakî fere dizîna berê zeytûna bikin; Û  pîvanên xelkê wan deveran nîşan didin ku dora75% ji werze wan gundan hatiye dizîn, lê giliyên xelkê jî bê sûde ne.

- Li 27.10.2022an. Z, li ser Riya "Meydana - Meydanekbezê" - N.Reco, Milîseyên "Feyleq El'şam" tevaya berê /60/darên zeytûnê yên mezin ên "Umer Qolaq Umer" ji xelkê Gundê "Gewenda - Meydana" dizîn.

- Milîseyên "Firqit El'hemze" 10% virgiyan li ser berhema tevaya werza zeytûna yên xelkê Gundê "Upila" - N.Bilibilê ferz dikin, û şormorên kêm ji Hemwelatî "Hisên Ibrahîm/65/sal" re - xelkê Gundê "Kerê - N. Bilbilê" kirin û gef bi lêdanê danê, di nav zeviyeke wî de ye nêzîk G. "Upila", piştî ku wî red kir ku vêrgiyê ji zeytûna bide wan, û çar çiwal zeytûna (dora/350/KG) jê qopirandin.

- Ji heftakê ve, Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" /8/çiwal zeytûna (dora 650KG) ji hevjîna "Seydo Seydo kurê Bêrem" (ê ji dora du heyvan ve li Bajarê Efrînê bi tuhmeta têkeliyê bi Rêvebiriya Xweser a berê re hatiye girtin) bi zorê birin, bi ser ku wê erêkirina berefkirina zeviyê hevjîna xwe ji encûmena xwechî jî wergirtibû.

- "Ferhan - berpirsiyarê rêbenda leşkerî" û "Ebû Hatêm" ji Milîseyên "Firqit El'sultan Mûrad" dest dînane ser/100/darên zeytûn ên bergirtî û yên Hemwelatî "Letîfe Horo" ji xelkê Gundê "Eşûnê" - N. Bilbilê, bi ser ku ew li gund e, jinebî ye û sêwiyên wê jî hene.

**= Geregoşî û serberdayetî:**

LI 27.10.2022an. Z piştî Nivro, li orta Bajaroka "Meydankê", bi sedema nelihevkirina li ser destdanîna ser zeviyên zeytûna yên xelkê bajarokê, di nav Milîseyên "Lîwa'i El'mu'itesêm/Firqit El'sultan Mûrad" û "Rîcal El'herb - mêrên şer" de pevçûnin çêbûn, û di encamê de endamek birîndar bû û sivîl jî tirsiyan.

**= Şewatên daristanan:**

Bi ser ku pileyên germahiyê nizmin jî, şewat li daristaneke nêzîk Bajaroka "Kefirsefrê" - Navça Cindirêsê dubare dibin, ev jî nîşan dide ku agir ji aliyê milîseyan de bi mebest di nav de têne vêxistin; Û "Berevaniya Sivîl li Efrînê" tekez kir, ku li 22.10.2022an. Z tîmên wê agirek li wir vemirandine û weha jî agireke din li 26.10.2022an. Z (ye ku ziyan gîhandiye /150/darî); Û ji wêneyên belavkirî tê xuyan ku çawa berê qutkirin ji darên wê daristanê re çêbûye.

**= Binpêkirinine din:**

- Piştî bendkirina wan bi rojekê, serkêşên Milîseyên "Lîwa'i Siqor El'şemal" li Gundê "Carê/Elîcaro" - N.Bilbilê şerê xwe di Hemwelatî "Reşîd Henan Îbo - Rêvebirê dibistanê, Hemze Xelîl Ibrahîm" dan û mekin li wan xistin, ji ber ku wan zeytûn berf kirin û nehîştin berhem ji aliyê wan milîseyan ve were talankirin û dizîn.

- Piştî qewtandina "El'şamiyê" û desteserkirina "El'emşat" li ser gundên "Mistika û Kela" - N.Şiyê, çekdarên "El'emşat", ji bo êzinkirin û bazirganiyê, bi rengekî fere dest bi qutkirina daristanên derdora herdu gundan kirin.

**-** Ji heftakê ve, piştî ku Hemwelatî "Henan Şamo" ji xelkê Gundê "Kurzêlê" - Şêrewa, li sibê zû makîna xwe ya pîkab li Taxa Pêşesaziyê - B. Efrînê rawestand, da ku hin karên xwe li bazara keskahiyê biqedîne, ji aliyê çekdaran ve makîna wî hate dizîn.

Nakokî û hevrikiyên milîseyan roj li dû rojê asta geregoşiya ku li Herêma Efrînê serwerkirî liba dike, û herweha jî talankirina ku dighêje werza zeytûna -jêdera jiyankirina xelkê ya serekin- hişweriya dizîtiyê ya li ba serkêşên wan milîseyan û gendeliya ku di nav refên wan de belavbûyî riswa dike.

30.10.2022an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**

**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

--------------------------

**Wêne:**

**-** Bînerdayîna "Osman Ne'iso" keyayê G. "Hisê/Mîrka" - N. Mabeta.

**-** Bînerdayîna "Menan Henan" ji G. "Erendê" - N. Şiyê.

**-** Bînerdayîna keyayê G. "Şîtka" - N. Şiyê.

**-** "Ednan El'xuweylêd/ Ebû Welîd El'ize" yê ji B. "Humsê".

**-** Şewatek li daristaneke nêzîk B. "Kefirsefrê" - N. Cindirêsê, 22.10.2022an. Z.

**-** Şewatek li daristaneke nêzîk B. "Kefirsefrê" - N. Cindirêsê, 26.10.2022an. Z.